Newroz **Hejmar (76) Rûpel (4) Ç. Pêşîn 2007z – 2619k**

Azadî ji mafê nerîn û derbirînê re !
Azadî ji pênûsa azad re !
Bang

Beriya derdora 8 mehan, rojnamevan **Ednan Hesenpûr** û çalakvanê sivîl **Ebdulwahid Bûtîmar**(Hîwa) ji bal desthilata Îranê ve li bajarê SINE hatin zindankirin. Li roja 18.07.2007an, dadgeha Islamî biryara bidarvekirina herdu rewşenbîr û xebatkarên kurd wergirtiye û ew di zindna tekane de cîwar kirine.

Bi rastî, şerm û fihêt e ku di demeke mîna dema me ya îro de mirov di welatê xwe de, ji bo nerîn û helwesta xwe ya azad bête bidarvekirin..!!

Li gora hemî zagonên navnetewî û prensîpên mafên mirovan di cîhanê de, mafê nerîn û derbirînê mafekî parastî ye, nabe tu dewlet, tu hêz vî mafî binpê bike û li gora berjewendiyên xwe yên tengî nijadperest vî mafê pîroz daqurtîne.

Em kovar û weşanên bi zimanê kurdî yên li Sûriyê derdikevin, vê biryara hovane ya derheqa herdu rewşenbîr û tekoşerên kurd şermezar û riswa dikin, bang li hemî dezgehên mafên mirovan, raya gştî ya cîhanê, hezkerên azadiya mirovan, hezkerên peyva azad dikin ku li dijî vê biryara ne mirovane serî hildin û ji bo serbestkirina wan têbikoşin.

- Azadî ji mafê nerîn û derbirînê re!
- Hilatina terorkirin û işkencekirina rewşenbîr û xebatkarên mafên mirovan ji cîhanê..!

Sûriya : 31.08.2007
* Kovara Aso
* Weşana Deng
* Kovara Gulistan
* Kovara Gelawêj
* Kovara Jîn
* Weşana Newroz
* Kovara Pirs
* Kovara Perwan
* Kovara Roj
* Kovara Vîn
*WeşanaZiman

Dumahîk: hevpeyvîn bi nvîskar....

P7- Çima wê asteng ji aliyê dewletê ve bêne pêşiya te?

B7-tiştin hene ezê nikaribim ser wan ve derbas bibim wek **(Dêrsim, Aleqemş, kuştina yawûz Selîm ji kurdan re, Helebçe, zêwe, serhildana Qamişlo**.....h.t.d).ev yek wê li ba dewletê bibe ciyê pirsê.

P8- Tu çi li ser kurdên sûriyê dizanî?

B8-bi rastî tu têkiliyên min bi wan re tune ne, ez liser wan nizanim. Lê belê ez dibihîzim ku di aliyê zimanê kurdî de li pêş in, di warê çand û hunerê de jî wilo ne, lê ew çi kar û xebatê dikin ez li ser wan nizanim .Sedema wê jî ewe ku ez bi zimanê kurdî nizanim .

P9-Tu çi ji xwendevanên Newrozê re di bêjî?

B9- Hîn min ev weşan ne xwendiye, lê bêgoman, tiştekî gelekî pêwîst û balkêş e ku weşanek wek wê di nav kurdên sûriyê de û bi zimanê dê, bête weşandin .Bi hêvî me ku di rojên bên de, win arîkariya min di komkirina agahiyên bi kurdên sûriyê ve girêdayî bikin, da ku wî projeyê min dayî xuyakirin pêşde bibim.

P10- Gotina te ya dawî?

B10-sipasiya min ji we re bê sînor e,li ba min tuştekî gelek pêwîst bû ku dengê min bighe kurdên sûriyê, hêviya serkeftinê ji weşana (NEWROZ)ê re dikim, bi hêvî me ew di asmanê çand û rojnamegeriya kurdî de bibe çirake bi ronak.

Yê bi karê wergerê rabû: **Adnan Akyûz**

Diyarbekir8-9-2007